Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1178 | 16-Pûşper-2024 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Giyayên derman ên ji Çiyayê Cîlo bi destê jinan tên berhevkirin



**Navenda Nûçeyan**

Jinên ku ji bo berhevkirina giyayan diçin Çiyayê Cîlo, piştî kedeke dijwar mîna ku bi xwezayê re dibin yek, giyayên derman tînin û sifreyên xwarinê pê dixemilînin.

Li Colemêrgê ku yek ji bajarên hênik e, piştî ku berf dihele, welatî ji bo berhevkirina pincaran berê xwe didin çiyayan. Li çiyayên ku giyayên cuda û derman li deverên bilind şîn dibin, ji bajarên derdorê jî gelek kes ji bo berhevkirina pincaran tên wan çiyayan. Yên ku pêşengiya vî karî dikin jin in. Jinên ku bi çenteyên li pişta xwe diçin Geliyê Bihuşt-Dojehê yê Çiyayê Cîlo, mendêya ku ji binê berfa ku derdikeve û di her xwarinê de tê bikaranîn berhev dikin.
Li geliyê ku bi dehan welatî ji navend û navçeyan tên hewa hê nû hinek germ bûye. Li bajêr ji berfê hê jî gelek rê nehatine vekirin, li Çiyayê Cîloyê ku qeşaya wî hê nû dihele, şêniyên herêmê dest bi berhevkirina pincaran kirin. Jinên ku bi kêran û çenteyên di destê xwe de diçin quntarên bi berf ên çiya, bi stranan bi dûrên komunal dixebitin, çenteyên xwe tijî dikin hevalên xwe yên li kêleka xwe dikin. Ew ref bi ref serê sibê diçin gelî, beriya ku bibe şev, çenteyên xwe hildigirin û vedigerin.

**‘Pincarên ku em berhev dikin ji bo hemû nexweşiyan derman in’**

Fatma Kara diyar kir ku bi hilkişîna Çiyayê Cîlo hem bêhna xwe dide û hem jî pincarê kom dike wiha got: “Ev der mîna bihuştê ye. Her derê axa me xweş e. Demekê ev der girtin û niha jî ji nû ve vekirin. Em nikarin her sal werin vê derê îsal em hatin. Giyayên mende, siyabo, rêwaz û hwd. kom dikin. Dema em nikarin werin vir em ji sûkê dikirin. Gelek kes hene ku vê dikirin û difiroşin lê îsal em li vir kom dikin. Pincarên ku em berhev dikin ji bo hemû nexweşiyan baş in. Ev giya bi ava berfê şîn dibin û em dikarin wê di her xwarinê de û di nava penîr de bi kar bînin. Her derê axa me pir dewlemend e, her tişt li vir heye. Em hem ji van deran hem jî ji keda xwe hez dikin.”

**‘Keda herî mezin a jinan e’**

Bese Topkan a ku ji navenda Colemêrgê ji bo komkirina pincarê tê deştê, du salan carekê diçe geliyan jî çiya ji bo berhevkirina pincaran. Besê Topkan, diyar kir ku gelê li vê derê her biharê dest bi demsala pincarê dike û wiha got: “Her pincara ku li çiya şîn dibe, nav û feydeya wê heye. Em ji bo sûdên wan bikar tînin. Em tên û di her demsalê de çi derdikeve berhev dikin. Van pincaran dixin nava xwarin, penîr û nan û di her tiştî de bi kar tînin. Dema zêde ma jî em davêjin dolabê ji bo zivistanê. Hem mêr hem jin tên vê derê, bi hev re dixebitin lê herî zêde jin kedê didin. Piştî komkirina wê em digrin û dişûn, paşê dipêjin û hildidin. Em diwestin lê hêjayî westandina me ye.”

**‘Ez ji bo zarokên xwe kom dikim’**

Kamîle Tekîn jî got: “Ez ji bo zarokên xwe hatim. Hevjînê min wefat kir û ez hewl didim wan xwedî bikim. Ji ber vê yekê ez bi cîranên xwe re hatim vê derê. Em bi hev re kom dikin û bi hev re malê tînin. Ji ber ku bi tendurist e ez berhev dikim, piştî ku bibim malê ez ê wan bişûm û bipijînim. Carna em bi gotina stranan kom dikin, carna jî bala xwe didin berfa li çiyayan. Em bi giştî giya mendê yê di bin berfê de berhev dikin.”

# Parastina amûrên kevneşopî mîraseke çandî ye

**Navenda Nûçeyan**



**Samî Eyşa destnîşan kir ku ew ji bo parastina mîrasa klasîk amûrên kevn berhev dike û wan ji tunebûnê rizgar dike.**

Samî Eyşa yê 39 salî ji bajarê Idlibê ye lê belê li Qamişloyê dimîne û bavê 4 zarokan e. Samî pir ji baxçeyê ku bi destên xwe ava kiriye hez dike. Samî Eyşa di nava baxçeyê xwe de odeyeke biçûk ava kiriye da ku ji bo cotkaran cihekî bêhnvedanê çêbike. Armanca Samî ew e ku cotkaran ji sarma zivistanê û germa havînê biparêze. Samî odeya xwe bi amûrên kevn ên çandî xemilandiye û amûrên berbehs gelekî kevn in ku hinek ji wan yên sed salî beriya niha ne. Di heman demê de Samî di baxçeyê xwe de darên cuda û kulîlkên reng bi reng çandine.
Samî Eyşa bal kişand ser berhevkirina amûrên kevn û ev yek anîn ziman: ‘’Ev 5 sal in min ev baxçe ava kiriye. Gelek amûrên kevn li cem min hene. Ez van amûran li bazaran peyda dikim ku hin malbat dema ku dixwazin tiştên xwe biguherînin, wan amûrên kevn difiroşin û ez jî diçim wan tînim yan jî dikirim. Gelek amûrên kevn bi dest dixim yên weke radyo, televîzyonên reş û sipî, telefonên kevn û amûrên hesin yên gelekî kevn. Her wiha ji ber ku bi amûrên kevn em dîroka xwe bi bîr tînin jî ez pir kêfxweş im. Ez van amûran ji bo parastina mîrasa klasîk berhev dikim. Her wiha ez dixwazim vê odeya xwe mezintir jî bikim da ku odeyê bi zêdetir amûrên kevn bixemilînim. Min baxçeyek li navenda bajêr ava kiriye sedema wê yekê jî parastina xwezayê ye û hewce ye em bi çandina şînkahî, dar û cûreyên gulan xezaya xwe biparêzin.’’
Samî Eyşa got ku wî navê Xerbûş Derb Eltenûr li odeya xwe kiriye û wiha qala wateya wê kir: ‘’Elxerbûş odeyeke bi teşeyeke kevin tê naskirin. Odeya min a ku bûye cihê amûrên kevnar jî pir kevn e. Her wiha di têketina baxçeyî de jî tenûrek kevnar heye û em ji wê rêyê re em dibêjin rêya tenûrê. Min ji ber wê yekê min navê Xerbûş Derb Eltenûr li odeya xwe kiriye.’’

**Bi kamîreya Birûc Resûl**



## FERHENGA BIWÊJAN

**Cewrik di zikê wî de nareyin:**
- Pozê wî naşewite; bêxîret e.

**Cilika bênamûsiyê girtiye ser çavê xwe:**
- Mirovekî bêxîret e; dest hilnayne.

**Çavên xwe kutane destê wî:**
- Bixwe ti karî nake çavên xwe dide destê wî; pêwîstiyên xwe ji wî dixwaze.

**Çavê xwe kutaye destan:**
- Bêxîret e; çavê xwe berdaye parsekiyê; dikare bixebite jî lê dîsa ji xelkê dixwaze.

**Çavên xwe pehn kirin:**
- Dest hilneanî; bêxîretî kir; bêhelwest ma.

**Çavê xwe pîs kir:**
- Xwe kêm kir; bêxîretî kir; dest hilneanî.

**Çavfireh e:**
- Tirsonek e; bêxîret e.

**Çawa ku mûyek ji qûna wî ketibe:**
- Bêxîret bûye; tiştek ne li xema wî ye.

**Çawa ku tirek jê bifelite:**
- Bi heman wateyê.

**Dema mirov ker be, wê her kes li mirov siwar bibe:**
- Ku mirov dengê xwe neke, wê her kes neheqiyê li mirov bike.

**Devê xwe sist kir:**
- Li dij derneket; li ber xwe neda.

**Guhên xwe şor kirin:**
- Dest hilneanî; li ber xwe neda; bêxîretî kir.

**Hestîkoj e:**
- Ji bo tiştekî piçûk xwe bêrûmet dike; xwe difiroşe; ji bo tiştekî piçûk li dijî civaka xwe, li dijî gelê xwe li cem dijmin cihê xe digire.

**Hestîkojiyê dike:**
- Bi heman wateyê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## ‘Armanca dewleta Tirk têkbirina deskeftiyên gelê Kurdistanê ye’



Hevserokê Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD Salih Mislim diyar kir ku armanc ji êrîşên dewleta Tirk ya dagirker yên li ser herêmê, têkbirina aramî û hevgirtina gelên herêmê ye.**R-3**

## Sema Yuce; Sembola jina azad



Şehêd Sema wiha dibêje:“Jinên Kurd gotinên Rêber Apo fêhm kirin, ku di 8’ê Adarê de gotibû ‘divê îdeolojiyek rizgariyê ya navenda xwe jin be, bê afirandin û tiştek bi vî rengî ji pirsgirêkên şer heta aştiyeke mayînde wê ji gelek pirsgirêkan re bibe çareserî’.**R-2**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1178 | 16-Pûşper-2024 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# RAMANÊ RÊBER ABDULLAH OCALAN BÛYE CÎHANÎ

Di çarçoveya pêngava ‘Ji Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêka Kurd re çareseriya siyasî’ rêzeçalakiyên bi navê ‘Rojên Diyalogê yên Bi Abdullah Ocalan re’ di navbera 15-22’ê Hezîranê de li 40 bajarên cîhanê têne lidarxistin. Çalakî, li ser mijarên bêhiqûqiya li Îmraliyê, girîngî û wateya paradîgmaya Abdullah Ocalan a ji bo gelan nirxandin tê kirin. Her wiha wê pirtûkên Abdullah Ocalan bêne danasîn, nivîsên wî yên li girtîgehê bêne xwendin, têkildarî tecrîda li Îmraliyê konferans, panêl, şano, çalakiyên hunerî, mîtîng, weşanên radyoyê û gelek çalakiyên cuda bêne lidarxistin.**R-4**



## Revandina Silêman Ehmed êrişeke li dijî rojnamegeriyê ye



Rojnamevan Zinar Cafer diyar kir ku dema mirov bi taybet behsa kiryarên PDK’ê bike yekser îxanetên ku di derheqê gelê kurd de dide meşandin tê bîra mirov û wiha got, “PDK’ê di derheqê gelê kurd de gelek kiryarên bi ziyan kirye, revandina Silêman Ehmed jî yek ji wan kiryara ye.”**R-5**

## Goristanên Şehîdan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê



Berdevkê Komîteya Şehîdan ê Bakur û Rojhilatê Sûriyê Hesen Ubeyd diyar kir ku li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê 28 goristanên şehîdan hene û got, “Şehîd qehreman û canfedayê gelê xwe ne.”**R-6**



## Jiyan û xebata helbestvan Azer Şiwêş

Azer Şiwêş helbestvanekî kurd e ku di sala 1964’an de li Amûdê çavê xwe li jiyanê vekirye. Her wiha wî li kêleka xwendina xwe xebata hunerî, şoreşgerî û wêjeyî kirye. Ji salên 1990’î ve dest bi nivîsîna helbestê kiriye û niha 3 dîwanên wî yên çapkirî û gelek helbest hene.**R-7**



**Gelo em, li Imrali dinêrin û xwe dipîvin?**
Ahmet Aktaş *R-4*

# Sema Yuce; Sembola jina azad

**Amara Baran/ Qamişlo**



Sema Yuce di sala 1971'ê de, li gundê Kargaliya, yê bi ser navçeya Tûtax a Agiriyê tê dinyayê. Malbata wê ji kevneşopiya berxwedana li Kurdistanê dihat û tevlî serhildana Agiriyê bûbû. Semaya ku bi vê kevneşopiyê hatibû mezinkirin, dema ku hîn biçûk bû bapîrê wê jê re digot "Leyla Qasim" û vê yekê jî ew ber bi lêpirsîneke kûr ve bir. Jixwe hîn dema biçûk bû jîr bû û her kesekê dizanî ku ew jî şopînera kevneşopa berxwedaniyê ye; ji bo wê di nav malbatê de jî her kesekê bi navê "Leyla Qasim" bang li wê dikir. Sema dibistana seretayî û amadeyî li Agiriyê dixwîne. Serketina wê ya li dibistanê û dilsoziya wê ya germ a bi hevalên wê re ji xwe di dersên wê re dide diyarkirin. Sema bi biryardariya xwe di sala 1989'an de derbasî beşa civaknasiyê ya ODTU'yê dibe û derbasê Enqereyê dibe. Polîtîkayên wan salan û gotinên wek "Me ew bin ax kirin û bi betonê ser pêça" ku li her aliyê Kurdistanê belav dibû, bû sedem ku Sema hîn di pola 3'yemîn a beşa civaknasiyê de bikeve pey bersivan û êdî ji bo xwe jiyana asayî nepejirîne. Di wan salan de, li wir ciwanên welatparêz nas dike û di nav ciwanên YCK'ê de cih digire. Di sala 1991'ê de dest ji zanîngehê berdide û beşdarî nava refên têkoşîna azadiyê PKK'ê dibe. Ji bo xebatê cara ewil derbasî Mêrdînê dibe. Dûre ji bo Rêberê gelê Kurd Abdullah Ocalan bibîne, derbasî Bekayê dibe. Li vir demekê perwerde dibîne û piştî demeke kin derbasî qada Serhedê dibe. Li wir dest bi kar dike Çavdêriya Sema ya di dema perwerdeyê de wiha tê vegotin: "Ez Rêbertî weke pêngav û rabûnekê dibînim ku dikare mohra xwe li serdemekê bixe. Ew jî Apoîzm e."

### Hevrê Sema li dijî xeta îxanetê sekneke Berxwedêr da nîşandan

Sema di sala 1992'an de, di pêvajoyekê de ku kar di asta herî bilind de dihat meşandin, li bajarê ku lê mezin bûye, di encama bêbextiyekê de tê binçavkirin û girtin. Lê tevî wê jî Sema tu caran ji sekna xwe tawîzê neda û li dijî xeta xiyanet û bêbextiyê bi sekneke berxwedêr bû mînak. Sema Yuce di rûniştina duyemîn a darizandina xwe de bi 22 sal hebsa giran tê mehkûmkirin. Destpêkê li Nevşehîr, dûre jî sirgûnê girtîgeha Çanakkaleyê tê kirin. Di tevahiya pêvajoya ku di girtîgehê de dimîne li ser hişmendî û nasnameya jina azad xwe kûr dike. Her wiha nêzîkatiyek ku derdora xwe jî dikşand vê hişmendiyê nîşan dide û her yek ji hevalên xwe yên jin ên li girtîgehê re ji nêz de eleqedar dibe, ew jî bi xwe re pêş dixistin û di hişmendiya zayendî de kûr dikir. Sema Yuce bi taybetî dema ku li ser helwest û kesayeta jina azad disekine û lêhûrbûnê dike, ji xwe re Zeyneb Kinaci û Zekiye Alkan dike esas. Jixwe di girtîgeha Çanakkaleyê de berpirs e û li dijî xeta xiyanetê ya li girtîgehê di nav têkoşînê de ye.

### Sema Yuce li girtîgehê di 21'ê Adara 1998'an de bedena xwe da ber agir û çalakiya Newrozê pêk anî

Sema Yuce, di sala 1971'ê de li Agiriyê hat dinê. Malbata wê tevlî serhildana Agiriyê bûye. Di nava malbatê de jê re digotin Leyla Qasim. Sema heta zanîngehê li Agiriyê xwend, di sala 1989'an de zanîngeha ODTU beşa civaknasiyê qezenc kir û çû Enqereyê. Li vir ciwanên welatparêz nas kir û tevlî xebatên ciwanan bû. Di sala 1991'ê de zanîngeh berda û tevlî têkoşînê bû. Sema piştî sal derbas bûn di Newrozê de li zindanê agir berda bedena xwe û dibêje çavkaniya wê ya dildariya azadiyê Zekiye Alkan e û wiha berdewam dike: "Dapîra min Zekiye bû û navka min Zekiyê birî." Sema di nivîsek xwe de dibêje ku "Du aliyên mirovan hene yek ronahî ye ya din jî tarîtî ye." Di nameya xwe de dibêje "aliyê wê yê tarî bêhêzî ye û yê ronahî jî Zekiye Alkan e." Sema, 21'ê Adara 1998'an de piştî Birdoziya Rizgariya Jinan hat îlankirin li Girtîgeha Çanakkaleyê got: "Ez dixwazim bedena xwe bikim pirek di navbera 8'ê Adar û 21'ê Adarê de" û bedena xwe da ber agir.

Sema ku demek dirêj li nexweşxaneyê hat dermankirin, di 17'ê Hezîranê de beriya jiyana xwe ji dest bide wiha dibêje: "Ez bûm Newroz, ez bûm Mazlûm." Di nameyên xwe yên hiştî de wiha dibêje: "Çawa ku li asîman du roj tune ne û dê nebe, ji bo mirovekî, ji bo jinek ku dixwaze azad bibe, hilbijartina du jiyanan û du navendên moralê nabin. Di kêliya ku ez vê nameyê dinivîsim de, min ji bo xwe Rêber Apo kir navenda fikir, moral û jiyanê, kêliyên ku min di xwe de hemû astengî derbas kirine. Azadî ji bo me hemûyan e û em dikarin gav bi gav ber bi azadiyê ve bimeşin.

Sema Yuce li girtîgeha Çanakkaleyê û di 6'emîn sala dîlgirtina xwe de, ji bo ku balê bikşîne ser xeta xiyanetê ya li girtîgehê û polîtîkayên şer ên dewletê, di 21'ê Adara sala 1998'an de bedena xwe dide ber agir û bi vê çalakiyê dixwaze bibe bersiva herî mezin a li dijî xiyanetê. Sema di şeva 21'ê Adara 1998'an de bi gotina; "Ez dixwazim bedena xwe bikim pirek di navbera 8'ê Adar û 21'ê Adar ê de", çalakiya xwe ya mezin pêk anî û çalakiya wê li tevahiya welêt deng veda. Asta hizrî ya ku Sema Yuce gihaştibûyê, ji bo Tevgera Jinên Kurd bû asta herî berz. Sema di encama çalakiya xwe de pir giran birîndar bû û ew rakirin nexweşxaneya Fakulteya Cerahî ya Stenbolê. Demek dirêj li nexweşxaneyê dimîne û di 17'ê Hezîranê de beriya ku bigihe şehadetê wiha dibêje; "Ez bûm Newroz, ez bûm Mezlûm." Di nameyên ku li pey xwe de hiştîbûn de wiha dinivîse: "Di van kêliyan de ku ez van rêzikan dinivîsim de jî, min ji bo xwe Rêber Apo kir navenda yekane ya hizrî, coş û jiyanî û ew kêliya ku min hemû astengiyên hundirîn di xwe de derbas kirin. Azadî ji bo me hemûyan e û em dikarin gav bi gav bigihin azadiyê."

### 'Ez dixwazim bedena xwe bikim pira 8'ê Adarê'

Sema Yuce di 21'ê Adara 1998'an de êvara li Girtîgeha Çanakkaleyê bi gotina "Ez dixwazim bedena xwe ji 8'ê Adarê heta 21'ê Adarê bikim pirek" bedena xwe da ber agir. Sema Yuce ya ku piştî çalakiya wê 80 roj li Nexweşxaneya Fakulteya Tipê ya Cerrahpaşa ya Stenbolê dihat dermankirin, di 17'ê Hezîranê de dema dihat dermankirin jiyana xwe ji dest da. Gotina wê ya dawî beriya ku li nexweşxaneyê bimire ev bû, "Ez Newroz im, ez Mazlûm im." Çalakiya Sema Yûce ji bo tevgera jinên Kurd dibe xala bazdanê. Nameyên ku wê li pey xwe hiştine jî naveroka wan wehaye:

"Çawa ku li ezmên du roj nînin û nabin, ji bo mirovek, ji bo jina ku dixwaze azad bibe du vebijêrkên jiyanê, du navendên exlaqî jî nabe. Dema ez van rêzan dinivîsim ew kêliya ku min Serok Apo kir navenda xwe ya yekane di aliyê hizrî, exlaqî û jiyanî de û min hemû astengiyên hundirîn ên di nava xwe de derbas kir. Azadî ya me hemûyan e û azadî gav bi gav bi dest dikeve."

### `Çawa ku li ezman du roj nabin, ji bo jinê jî du çavkaniyên coşê nabin'

Sema Yuce di nameya xwe ya ji bo Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de wiha qala xwe dike: "Ez di sala 1971'ê, li Agiriyê hatim dinyayê. Di nav Tevgerê de min navên rêxistinî yên Leyla û Serhildan bikaranîn. Ez di nav malbateke ku di nav feoldalîteya Kurd de xwedî cih bûye, lê di tevahiya dîroka komara Tirkiyeyê de ne bi rejîmê re bûne yek û ne jî tam karîne nasnameya kurdayetiyê biparêzên, her wiha her ku çûye di nav pergalê de heliyane û bi qasî madî her wiha manewî jî lewaz dibin de mezin bûm. Em şeş xwîşk û bira ne. Malbata min welatparêz e. Di nav malbatê de apê min ê mezin bi navê Leyla Qasim bang li min dikir. Hem ev yek ku ji salên 70'î di hişê min de mabû û hem jî bandora wê ya kûr bû hevdîtina min a bi têkoşîn û girsebûna salên 90'î. Di zaroktiya xwe de, di şexsê malbata xwe de ez bûm şahidê tevahiya şer û nakokiyên rastiya Kurd û min ev yek ji nêz ve dît. Herî dawî jî di saziyên perwerdeyê yên Kemalîzmê de ev yek hîn zêdetir bi pêş ket." Yuce di beşek din a nameya xwe de dibêje çawa ku li ezmên du roj nabin, ji bo jinê jî du çavkaniyên coşê nabin û wiha didomîne: "Ji ber ku min xwe li ser bingeha rast birêxistin nekir, asta têgihîştina Rêbertiyê bi dem û mekan re li hev neanî, min nekarî paşverûtiyên di kesayeta xwe de derbas bikim. Di heman demê de, di nav refên têkoşînê de tevî ku li dijî koletiyê bi hêrs bûm, li dijî xwe ferzkirinên civaka serwer a mêr min nekarî sekneke bihêztir raber bikim." Sema Yuce di beşek din a nameya xwe de dibêje, ew dema ku dizivire û li pey xwe dinêre, dibîne ku wek jinek Kurd, her mirovek Kurd ku ber bi rêya birêxistinê ve diçe, her wiha wek her mirovekê ku gelek lewaziyên mirovî ku tûşê dibe, dît ku min jî pirsgirêkên kesayet, kêmaniyên siyasî û rêxistinî jiyan kirin û wiha didomîne: "Lê min tu caran di cihê xwe de nehejmart. Doktirîna azadiyê ku di pêşengtiya Rêber Apo de bi pêş diket, her tim bû hêza ku ez li ser piyan digirtim. Di vê xalê de ez dibînim ku hemû nakokiyên civaka Kurd û çînên serdest ên Kurd di kesayeta jinê de gihiştine asta xwe ya dawî û ev jî xala derbasbûnê ye. Bêyî mubalexe, di kesayeta xwe de di asta nakokiyê de, nakokiyeke bi hezar salan hîs dikim û têdigihijim. Ev di heman demê de KÊLIYA ku min xwe derbas kiriye, îfade dike."

### 'Ez dixwazim bibim şopdarê Kawayê hemdem Mazlûm'

Sema Yuce di nameya xwe de işaretê bi nirxandinên Rêber Ocalan ên 8'ê Adarê dike û wiha pê de diçe: "Jinên Kurd gotinên Rêber Apo fêhm kirin, ku di 8'ê Adarê de gotibû 'divê îdeolojiyek rizgariyê ya navenda xwe jin be, bê afirandin û tiştek bi vî rengî ji pirsgirêkên şer heta aştiyeke mayînde wê ji gelek pirsgirêkan re bibe çareserî'. Jixwe di meşa xwe ya bi 8'ê Adarê destpê kir û bi 21'ê Adarê giha lûtkeyê, ev yek îspat kir. Li ser vê bingehê ez dixwazim mêjî, dil û bedena xwe bikim pirek ji agir a di navbera 8'ê Adarê û 21'ê Adarê de. Ji bo ku bibim xwendekarek baş a Kawayê hemdem Mazlûm Dogan û hemû şehîdan, dixwazim wek Zekiye bişewitim, wek Rehşan bibim Newroz. Ez dixwazim bi awayekî bi biryar li ser şopa hevalên din ên bûne Newroz, Bêrîvan, Ronahî, Mîrza Mehmed û Eser bimeşim. Hezkirina min a azadiyê mezin e û ez dixwazim wê bi azwerî û hişmendiya jiyanê re bigihînim hev.

Sema Yuce di helbestekê ku bi xwe nivîsî ye de hestên xwe wiha tîne ziman:

Ez îro hatim dinê<br>
Tam hefsed û sî roj berê, di 1'ê Nîsanê de<br>
Min henaseya xwe ya ewil li Amedê, li ber deriyê Mêrdînê stand<br>
Bi navê Zekiye Alkan banî pîrika min kirin<br>
Bêhna welat jê dihat<br>
Sînga wê ya şewitî<br>
Ji bo ku diya min êş nekşîne, jana wê zêde nebe<br>
Di bedena xwe agirek mezin pêxistibû



# Jiyan û xebata helbestvan Azer Şiwêş

Azer Şiwêş helbestvanekî kurd e ku di sala 1964'an de li Amûdê çavê xwe li jiyanê vekirye. Her wiha wî li kêleka xwendina xwe xebata hunerî, şoreşgerî û wêjeyî kirye. Ji salên 1990'î ve dest bi nivîsîna helbestê kiriye û niha 3 dîwanên wî yên çapkirî û gelek helbest hene.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**



Helbestnivîsîn û helbestvanên kurd li Rojavayê Kurdistanê beriya Şoreşa 19'ê Tîrmehê rastî gelek astengiyan dihatin û nikarîbûn mijûlî xwendin û nivîsîna bi zimanê kurdî bibin. Lê tevî wiha jî gelek nivîskar, rewşenbîr û helbestvanên kurd karîbûn xebatekê ji bo civaka xwe bikin, ji van kesan jî Azer Şiwêş e. Girêdayî jiyan, xebata hunerî û helbestnivîsîna Azer Şiwêş, ji rojnameya me re axivî.

### Jiyan û xwendin

Azer Şiwêş di derbarê jiyan û xwendina xwe de wiha anî ser ziman: "Ez di sala 1964'an de li gundê Xirbe Xedîr yê girêdayî navçeya Amûdê ji dayik bûme. Min li gundê Zeynar yê ku li kêleka gundê me bû, xwendina xwe ya seretayî bi dawî kiriye. Piştre jî hatim Amûdê û xwendina xwe ya navîn û amadeyî li wir qedandiye. Her wiha ez çûm Helebê û di zanîngeha Helebê de beşê Endeziyariyê xwendiye û di sala 1989'an de ez jê derçûme. Di wan salên xwendina zanîngehê de min Tevgera Rizgariya Kurdistan nas kir û bandora wan li min hat kirin. Piştî derçûnê jî ez li Dêra Zorê bûme karmendê hikumeta Şamê. Di salên 1900'î de min di nav komên hunerî yên kurdî de xebat dikir û hem jî karê şoreşgerî û netewperweriyê li gorî derfetên heyî li nav gel dimeşand. Her wiha Kovara Rojda li herêma Cizîrê bi hevkariya sê kesên din me derxist, ji wan kesan Nezîr Mele bû, min di kovarê de wek edîtor kar dikir. Piştre jî çûm Libnanê û di Kovara Sorgul de karê rojnamegeriyê kir. Di heman demê de jî li Libnanê bûme nûçeghianê televizyonên kurdî yên li Belcîkayê. Her wiha di sala 2005'an de koçberî derveyî welat,Elmaniyayê bûm, derketina min ji ber pirsgirêka girêdayî tendurstiya min bû û aliyê din jî ji ber mercên siyasî bû. Piştî demekê ez çûm Belcîkayê û di Ronahî TV de çend salan karê rojnamegeriyê kir.

### Destpêka hunera nivîsînê

Şiwêş têkildarî destpêka rahiştina pênûsa wêje û hunerê wiha axivî: "Nivîsandin hunereke girêdayî jiyan û rewşa mirov a takekesî ye. Di wêjeyê de nivîsandina giştî û bi taybet nivîsandina helbestê ne ji valahiyekê ve tê ew hest ji kaniyên heskirin û evîna mirov tên. Ji destpêk de min ji pênûs û nivîsînê hez dikir, nivîskarî û wêje ne di hizir û xeyalê min de bûn. Piştî salên 90'î ez nêzî wêjeyê bûm û min rahişte pênûsê û dest bi nivîsê kir. Min bi zimanê erebî dinivîsand û hem jî xwe fêrî zimanê kurdî jî kir. Her wiha di wê dema ku min kar û xebata hunerî ya koman dikir, ez ketim bin bandora helbestvan û şanoger Beşîrê Mele Newaf de. Wî berî me dest bi nivîsandina helbest û şanoyê kiribû û ew tê de bûbû bispor. Me demeke dirêj bi hev re kar û xebata wêjeyî kir, lewma bandora helbestên wî li min bû. Êdî ji wê demê û bi şûn de min xebateke nivîsîna helbestê dest pêkir. "

### Helbestnivîsîn li cem Azer Şiwêş û berhemên wî

Nivîskar Azer Şiwêş girêdayî nivîsandina helbestê, li rex wê jî karên din wiha got: "Kesayetê nivîskar û bi taybet helbestvan ne tenê milkê xwe ye, lê belê ji civak û gelê xwe re ye. Ew hest û ramanê gelê xwe, xweza û welatê xwe vedihewîne nav helbestê xwe. Her wiha da ku her helbestvanekî/e kurd asta helbestên xwe bilind bike û helbestên helbestvanê kilasîk mîna Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî bixwîne. Heya ku nivîs, wêje û helbesta helbestvan li pêş bikeve û bibe bingehek ji nifşên pêşdemê pêwîste pêşengên wêjeya xwe û wêjeya cîhanî bixîne. Pêvajoya nivîsîna min ji destpêkê heya niha wisa bû. Dema ku ez li Libnanê bûm min xebatek di xizmeta civaka xwe de dikir û helbest jî dinvîsandin. Ji xwe yekem dîwana min bi navê Demsala Dil li çapxaneya Amar da ya li Libnanê di sala 2002'an de hate çapkirin. Her wiha dîwana min a duyem a bi navê Bêyî te li Helebê di sala 2003'an de çap bûye. Dîwana 3'an a bi navê Delal Can jî di sala 2015 de li Amedê hatiye çapkirin. Naveroka helbestên min bi giştî li ser evîn, hezkirin, xaka welat, li ser şehîdan, çiyayên Kurdistanê ye. Lewma min girêdayî van mijaran 3 dîwan çap kirine û ji bilî van dîwanan gelek helbest û nivîsên min hene lê hîna nehatine çapkirin. "

# Rastiya Rojê li Efrîkayê...(4)

**Mistefa Rêzan.**


Parzemîna Efrîqa bû şahid ji gelek ol û baweriyan. Bandor li baweriyên parzemînên din kirin û ji wan jî bi bandor bûn. Ji ber ku ev herêm ji herêmên herî germ di cîhanê de ye, hebûna rojê wek sembol û bawerî pir xwedî wateyek cuda ye. Şaristaniya Misrê û şaristaniya Amazîgiyan şaristaniyên herî navdar li parzemînên Efrîkayê. Ji lewra di neqşên li ser şûnwarên dîrokî de bingha van şaristaniyan hatine nivîsandin. Destpêka ku mirov hewl dide rastiya gerdûna û hebûnê fêm bike. Bawerî li ser bingeha zanîna stêrnasî, werzên sale, jiyan li vê dinya û dinyaya din hatiye avakirin. Di van şûnewaran de diyar dikbe bê çiqas mirovên serdemê pêşî yên van şaristaniyan hewl dane li heqîqeta hebûnê bigerin. Şûnewarên pir bi heybet û mezin ku bi hezarên salan bi tevî hemû rewşên avhawayê yên dijwar ve jî hata îro xwe parastine. Pîramîdên li herêma Cîze ya Misrê mînaka herî ber bi çav e.

### 1-Li Misrê baweriya rojê:

Gelek şîroveyên li ser nave Amûn Rah ji ku hatiye û çawa tê bilêvkirin hene. Di vê baweriyê de Amûn xwediyê hêza rojê ya ronahî û germahiya ku dide erdê. Hin şîrove dibêje ku gotin Amîn ya di olên yek xweda de bi taybetî di Îslamî de, ji gotina Mirsrî ya kevin Amin hatiye. Ji ber ku roj di jiyana mirovan de pir pîroz, ne dûr e ku ev bi riya Îbraniyan ango qewmê Hz. Mûsa derbasî hemû olên yek xweda bûye. Lê çawa Amûn Rah bû xwedayê herî mezin li tevayî Misrê?

Li gorî agahiyên hatine bidestxistin, dema deshilatdariya xwandana 8. a Frawenên Misrê, hemleyên êrîşê bi ser Sûriyê Nûba û Lîbyayê de kirne û bi serketine, hingî xwedayê herî bi hêz Amûn Rah derketiye. Ji lewra li ser dîwarên pîramîdên Misrê sembolên Roj tîrêjên jê derdikevin hatine nivîsandin. Dîsa çavê xweda Horus ku ronahiya xwe ji rojê digire nişaneya pîroziya vê baweriyê. Rengê zer yê zêr ku mîna rojê ye, li ser hemû dîwarên pîramîdan heye.

Zaniyariyên endaziyarî û arkeoljiyê, dibêjên ev pîramîd ne tenê gorên qiralên Misrê ne. Lê belê ev pîramîd ji bo naskirina her çar werzên sale, şopandina tevgera rojê û stêrên ezmanan hatine bikaranîn. Hata hin zaniyariyên fîzîkê jî, dibêjin ev pîramîd mîna çavkaniya enerjiya ku ji rojê tê kom dike û ji bo hin armancên taybet tê bikar anîn. Pîvanên goşeyên van pîramîdan bi rengekî pir taybet hatine bikaranîn, ew kevirên giran çawa hatine bi cih kirin hata roja me ya îro, zaniyaran matmayî dike. Hêza ronahiyê ya lêgerîna rastiya gerdûnê û hebûnê bi awayekî ku em texmîn nakin li ser vê zemînê hatiye pêşxistin.



Mirovên Misirî bi bandora gelek şaristaniyan, bi taybetî şaristaniyên di navbera çemû Firat û Dicleyê de di nava lêgerîna heqîqeta ezlî ya afirandina gerdûn û hebûnê bûne. Ne şaşe em li vir bêjin, asteke ne kêm ya şaristaniya li Misrê ya têgihiştiya siren xweza û yasayên gerdûnê bûne. Hişmendiya oryantalîst, bi matmayî dibêjin ev asta pêşketina endaziyarî, astronomî û fîzîkî dibe ku bi bandora hin hêzên derveyî erdê ve pêkhatiye. Ji lewra ev nêrîn li hember şaristaniya Misrê neheqiyek mizin. Mînaka herî balkêş ya şopandina Misriyên dema firawenan ji sîstema rojê û endaziyariyê, tê gotin dema peyker û tabûta Ramses di hundirê pîramîdê de hatiye danîn, hesabê dema roja derdikeve û diçe ava tîrêjên, di dema rojbuyîn û roja tacîdarkirina wî de lêdie û ronî dike. Eger ku ev nenaskirina sîstema rojê û endaziyariyê ye ma çiye? Di asteke bilind a zaniyariya fîzîk, astronomî û endaziyariyê heye. Li vir li gor herêmên derdora xwe lêgerîna heqîqetê ku mirovatî ji destpêkê lê digere hata niha, pir bi pêş ve çuye.

Rastiyek din ku mirov ji şaristaniya Misrê fêm dike, ew sembolên çav û rojê li ser dîwarên hundir yên gor û perestgehan pir tên dîtin. Sedema vê, ku roj bi qasî ku germaî û ronahî dide, ewqasî wateya ronahî û enerjiya ruh temsîl dike. Her weha çav ronahiya rojê dibîne û xwe ji taritiyê dûr dixe. Di astekî de buyerên astronomîk û baweriya ruhî ve digihêjin hev. Ji ber vê baweriyê ye, ewqas peyker, perestgeh û pîramîdên pir bi heybet ku mînaka wê li ti dera cîhanê tune ne, hatine avakirin.

### 2- Bandora rojê li ser Amazîgan:

Dîrokzanan dibêjin dîroka Amazîg hata 1000 B.Z diçe. Li gor zaniyaran, di sala 950 B.Z Fermandarê Amazîgî Şêşenqê Yekemîn bi hêzeke mezin Misrê dagir dike û xanadaneke firawenên Amazîgî tine ser deshildariyê. Hatiye gotin ku xanadana 22 û 23.mîn ên firawenî Amazîgînin. Ji lewra baweriyê olî yên Misirî bi hemû aliyên xwe ve derbasî herêmên Amazîg li tevayî bakurê Efrîkayê dibe. Di wê demê xwedayên Amazîgan wek Atlas Tanîs, Poseydon û Antî ne. Hêjaye goitnê ye ku yek ji wan xwedawendeke jin, ew jî Tanîs e. Ew xwedawenda berhemdarî û zindîbûnê ye. Ew parsevana Qertacê ye.

Heredot û Îbnî Xeldûn gotiye li devera niha Fas û Tûnisî Amazîgiyan îbadeta rojê dikirin. JI ber ku sembola rojê li ser qelek keviran hatiye neqişkirin. Dîsa îfadeyên rojê wek stêr û rojê li ser zend û eniyên jinên bi temen hata niha tê dîtin. Ne şaş e mirov bêje ku baweriya bi hebûna rojê wek ronahî, germahî û di heman demê de lêgerînê rastiya ruh û hebûnê pênase dike. Her çiqas hemleyên dagirkeriyê bi ser vî gelî de pêkhatine, ji roma, hêzên Îslamî yên Erebî, Fransî û Îtalî ve lê dîsa vî gelî hebûna xwe parastiye. Li hember hemû bişaftin û asimlasyonê li ber xwe daye. Her çiqas bandor zimanên hêzên derve l ser çanda wan buyî jî, lê dîsa ziman, folklore û adetên civakî yên Amazîgiyan hê jî mane. Mirov dikare bêje şibihandinek di navbera Kurd û Amazîgan de heye.

# Goristanên Şehîdan Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê

Berdevkê Komîteya Şehîdan ê Bakur û Rojhilatê Sûriyê Hesen Ubeyd diyar kir ku li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê 28 goristanên şehîdan hene û got, "Şehîd qehreman û canfedayê gelê xwe ne."

**Ronaz Silêman/Qamişlo**



Li ser asta Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi hezaran jin û xortên pêkhateyên Ereb, Kurd, Aşûr, Sûriyan, Êzidî û bi 100`an şehîdên enterasyonal di Şoreşa Rojavayê Kurdistanê û berxwedana ku li hemberî dewleta Tirk a dagirker û çeteyan hat kirin, gihiştin asta şehadetê, di encama wê de bi 10`an goristanê şehîdan hatin avakirin. Ev qehreman û berxwedêrên ku şehîd bûne bi axa bajarê xwe hatin e sipartin, di encama wê de bi lidarxistina şoreşê û heta roja îro zêdeyî 30 goristanên şehîdan hatine çêkirin û bi hezaran şehîd tê de hatine oxirkirin. Lê mixabin di encama êrişên dewleta Tirk a dagirker de 4 goristanên şehîdan ketin destê dijmin û ew gortistan bi hovitî hatin wêrankirin, ew goristan jî ya bajarê Efrîn, Girê Spî û Serê Kaniyê bûn. Lewra niha li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê goristanê şehîdan ên ku hene 28 goristanin, di hundirê van goristanan de jî gorên bi 1000`an şehîdan lê hene.

**Goristanên Yekem**

Goristanên yekem li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatin avakirin evin: Goristana Şehîd Xebat Dêrikê, li bajarê Dêrikê ye, Goristan Rustem Cûdî, li bajarê Dirbêsiyê ye û Goristana Şehîd Dicle ku li bajarê Kobanê ye.

**Goristanên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê evin:**

Li Kantona Cizîrê 14 goristan hene.
Li Kantona Dêra Zorê 3 goristan hene.
Li Kantona Reqa 2 goristan hene.
Li Kantona Şehba û Heleb 3 goristan hene.
Li Kantona Minbicê goristanek heye.
Li Kantona Kobanê 4 goristan hene.
Li Kantona Tebqa goristanek heye.
Li bajarên dagirkirî yê Efrîn 2 goristan, Serê Kaniyê goristanek û Girê Spî goristanek hebûn, niha ji aliyê dewleta Tirk û çeteyên wê ve hatine wêrankirin.

**Dîrokê avabûna her goristaneke şehîdan**

Goristana Şehîd Rustem Cûdî a girêdayî bajarê Dirbêsiyê di 27`ê Îlona 2011`an de hatiye avakirin.
Goristana Şehîd Xebat Dêrikê a girêdayî bajarê Dêrikê di 10`ê Îlona 2011`an de hatiye avakirin.
Goristana Şehîd Dicle ya girêdayî bajarê Kobanê di sala 2011`an de hatiye avakirin.
Goristana Şehîd Delîl Saroxan a girêdayî bajarê Qamişlo di 8`ê Gulana 2012`an de hatiye avakirin.
Goristana Şehîd Dilşêr ya girêdayî bajarê Tirpêsbiyê di sala 2012`an de hatiye avakirin.
Goristana Şehîd Ismayîl Hogir a girêdayî bajarê Amûdê di sala 2013`an de hatiye avakirin.
Goristana Şehîd Dijwar Cemal a girêdayî bajarê Hesekê di 6`ê Hizêrana 2013`an de hatiye avakirin.
Goristana Şehîdên Komkujiya Kobanê ya girêdayî bajarê Kobanê di sala 2015`an de hatiye avakirin.
Goristana Şehîd Berxbotan a girêdayî bajarê Kobanê di sala 2015`an de hatiye avakirin.
Goristana Şehîd El Elî Tahir a girêdayî bajarê Qamişlo di 27`ê Tîrmeha 2016`an de hatiye avakirin.
Goristana Şehîdên Sivîl a girêdayî bajarê Hesekê di 5`ê Gulana 2016`an de hatiye avakirin.
Goristana Şehîdên Sûriyan Aşûriyên ya girêdayî bajarê Hesekê di sala 2016`an de hatiye avakirin.
Goristana Şehîd Îqab El-Isûd a girêdayî Til Koçer di 1`ê Tîrmeha 2017`an de hatiye avakirin.
Goristana Şehîdên Tilhemîs a girêdayî Tilhemîsê di sala 2017`an de hatiye avakirin.
Goristana Şehîdên Tiltemir a girêdayî Tiltemirê di 25`ê Çileya 2017`an de hatiye avakirin.
Goristana Şehîdên Aşûriyên a girêdayî Tiltemirê di sala 2017`an de hatiye avakirin.
Goristana Şehîdên Şedadê ya girêdayî Şedadê di 10`ê Hizêran 2017`an de hatiye avakirin.
Goristana Şehîd Xidir Ehmed a girêdayî bajarê Dêra Zorê di sala 2017`an de hatiye avakirin.
Goristana Şehîd Hanî Elhesen a girêdayî bajarê Dêra Zorê di sala 2017`an de hatiye avakirin.
Goristana Şehîdên Elhikûmiye ya girêdayî bajarê Reqa di sala 2017`an de hatiye avakirin.
Goristana Şehîdên Berxwedana Serdemê ya Şehba û Helebê di sala 2017`an de hatiye avakirin.
Goristana Şehîdên Minbicê ya girêdayî bajarê Minbicê di sala 2017`an de hatiye avakirin.
Goristana Şehîdên Sirînê ya girêdayî bajarê Kobanê di sala 2017`an de hatiye avakirin.
Goristana Şehîd Sêvdar a girêdayî bajarê Reqa di sala 2018`an de hatiye avakirin.
Goristana Şehîd Zozan Efrîn di sala 2019`an de hatiye avakirin.
Goristana Şehîdên Tebqa a girêdayî bajarê Tebqa di sala 2019`an de hatiye avakirin.
Goristana Şehîdên Berxwedana Şêxmeqsûd a Eşrefiyê di sala 2020`an de hatiye avakirin
Goristana Şehîdên Feratê ya girêdayî bajarê Dêra Zorê di sala 2020`an de hatiye avakirin.

Derbarê dîroka avakirina Goristanên Şehîdan yên Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê, berdevkê Komîteya Şehîdan ê Bakur û Rojhilatê Sûriyê Hesen Ubeyd ji rojnameya me re axivî.

Hesen Ubeyd diyar kir ku şehîd nirxê herî pîroz e û wiha got: "Şehîd nirxên herî mezinin û pêwîste neyên binpêkirin. Wesiyata wan berî her tiştî pêwîste were bidest girtin. Hin pêvajoyên dîrokî hene ku ji bo tevayî mirovahiyê bi wate ye, yên ku mohra xwe li van pêvajoyan dixînin şehîdin. Şehîd xwedî cihek girîng e û di nava welatê xwe nayêne jibîrkirin. Her çiqa ku di dem û cihên cûda de têkoşiyabin û hin ji wan qet hev nedîtibin jî, lê Şehîd qehramanên ku canê ji bo azadiya gelê xwe feda kirin e. Rêber Abdullah Ocalan şehîdan weke dîroka nû ya gelê Kurd dinirxîne, dîrokeke zindî û afirîner, dîrokeke ku gereke baş were xwendin û were tê gihiştin. Herwiha dibê tu kes jibîr neke ku bi saya xwîna şehîdan em azadî dijîn."

# Di temenê xwe yê ciwantiyê de mohra xwe danî binê gelek serkeftinan

**Navenda Nûçeyan**




Canşêr li gel temenê xwe yê ciwan bi berpirsyariyeke dîrokî, bi xwînsariya fermandarekî şer meşiya. Rûmet û serketina şerê gerîla yê demê di temenê xwe yê 20 salî de bi cih kir.
Li çeperên berxwedanê yên Kurdistanê şervanên herî fedaî yên serdemê hene. Çawa ku her şer leşker û fermandarên xwe diafirîne, Têkoşîna Azadiyê ya Kurdistanê jî fedaiyên xwe yên serdemê diafirîne.
Canşêr Şêrawa (Kemal Merwan Oso /Efrîn) li navçeya Şêrawa ya Efrînê ji dayik bû. Beriya operasyonên şoreşgerî yên li Herêma Şehîd Delîl a Rojavayê Zapê me ew nas kir. Yek ji wan gerîlayan bû ku bi rengekî çalak beşdarî hemû amadekariyên çalakiyê bû ku di bin fermandariya Andok Adil û Hewrê Çiya de hate birêxistinkirin. Li Qada Berxwedanê ya Girê Amediyê tevlî keşfên çalakiyê bûbû. Çû heta nêzî çeperên leşkerên dijmin, rewşa wan, liv û tevgera wan, teknîka li ber destê wan û meylên wan yek bi yek tesbît kiribû.

**Tecrûbeya xwe ya destpêkê li efrînê bû**

Hîn gelekî biçûk bû bajarê wî, yanî Efrîn li êrişên dagirkeriyê rast hatibû. Hingî şer nas kiribû û tecrûbeya xwe ya destpêkê ya gerîlatiyê li Efrînê dîtibû. Di êrişeke hewayî ya li ser Efrînê de bi giranî birîndar bûbû, lê belê bû yek ji wan kesan ku heta kêliya dawî îradeya Efrînê parast. Dem û cihê tolhildanê tine bû, lewma ji bo hilanîna tola bûyerên li bajarê wî qewimî wê li Qada Berxwedanê ya Girê Amediyê bibûya gerîlayê pêşeng ê operasyonên şoreşgerî. Ji ber vê jî xwe ji ti karê serkeftina operasyonan neda alî. Carna kedkarekî peydakirina pêxwarin û cebilxaneyan bû, carna tevlî baskê êrişê yê çalakiyan bû, carna jî şervanek bû ku derba giran li dijmin dixist.

**Bû yê destpêkê ku derbe li dijmin xist**

Canşêr di 20'ê Mijdara 2023'an de tevî Fermandar Şehîd Hewrê Çiya bû gerîlayê herî bi lez ê li Girê Amediyê bi ser çeperên dagirkeran ve çû. Mîna ku gelekî dereng maye û dixwaze wezîfeya xwe êdî temam bike bi lez meşiya, çend saet beriya plansaziyê xwe gihand çeperan, di bin çeperên dijmin de neçar mabû li benda hevalan bisekine. Bi hêrsa tolhildanê ya di dilê xwe de li ser çeperên dijmin reşand. Wê rojê li çeperên dagirkeran ên li Girê Amediyê bi dehan leşker hatibûn kuştin.

**Her tim cihê xwe di nava baskê êrişê de digirt**

Di 12'ê Çileya 2024'an de di operasyona Şoreşgerî ya Şehîd Helmet Dêralûk de jî li baskê êrişê li refên herî pêş şer kir. Canşêr yek ji wan gerîlayan bû ku di nava berfê de şer kir, benzîn bi ser çeperên dijmin de rijand û şewitand. Beriya her çalakiyê xwe ji bo baskê êrişê pêşniyar dikir.

**Mîna her carê li pêş bû, bi tenê bû**

Li Qada Berxwedanê ya Girê Aamediyê di 19'ê Adara 2024'an de operasyona Şoreşgerî ya Şehîd Ciwan-Şehîd Andok hate lidarxistin. Gerîlayan ji gelek baskan ve dor li dagirkeran pêçandin û çeperên dagirkeran yek bi yek xistin. Canşêr careke din li refên herî pêş bû, li nêzî çeperên dagirkeran bi ser leşkeran ve diçû. Mîna her carê li pêş bû, tevî hişyariyan jî bû yek ji wan gerîlayan ku di dema çalakiyê de bi tena serê xwe bi ser dagirkeran ve diçû. Tevî ku hevalên wî timî jê re digot, 'Canşêr tenê neçe, Canşêr xwe biparêze' kesî nikarîbû wî bisekinîne. Ne ji ber acemîtiya di gerîlatiyê de, lê ji bo parastina hevrêyên xwe dilezand û bi tena serê xwe bi ser leşkeran ve diçû. Mîna hevalê Serxwebûn ku bi înîsiyatîfa xwe di kêliya herî giran a çalakiya Girê Amediyê de çalakiya fedaî pêk anî.

**Di temenê xwe yê ciwan de tevlî gelek şeran bû**

Gotina 'Heta dilopa xwe ya dawî, heta fîşeka xwe ya dawî şer kir û şehîd bû' dibe ku herî zêde li Canşêr bê. Ev gotin bi şênberî herî zêde Canşêr pênase dike. Naxwe mirovek di 20 saliya xwe de çiqasî dikare tevlî şer bibe? Di temenê xwe yê ciwantiyê de mohra xwe danî binê gelek serkeftinan.
Li çeperên berxwedanê yên Kurdistanê şervanên herî fedaî yên serdemê hene. Çawa ku her şer leşker û fermandarên xwe diafirîne, Têkoşîna Azadiyê ya Kurdistanê jî fedaiyên xwe yên serdemê diafirîne.
Canşêr Şêrawa (Kemal Merwan Oso / Efrîn) li navçeya Şêrawa ya Efrînê ji dayik bû. Beriya operasyonên şoreşgerî yên li Herêma Şehîd Delîl a Rojavayê Zapê me ew nas kir. Yek ji wan gerîlayan bû ku bi rengekî çalak beşdarî hemû amadekariyên çalakiyê bû ku di bin fermandariya Andok Adil û Hewrê Çiya de hate birêxistinkirin. Li Qada Berxwedanê ya Girê Amediyê tevlî keşfên çalakiyê bûbû. Çû heta nêzî çeperên leşkerên dijmin, rewşa wan, liv û tevgera wan, teknîka li ber destê wan û meylên wan yek bi yek tespît kiribû.

**Her tim cihê xwe di êrişê de digirt**

Canşêr di 20'ê Mijdara 2023'an de tevî Fermandar Şehîd Hewrê Çiya bû gerîlayê herî bi lez ê li Girê Amediyê bi ser çeperên dagirkeran ve çû. Mîna ku gelekî dereng maye û dixwaze wezîfeya xwe êdî temam bike bi lez meşiya, çend saet beriya plansaziyê xwe gihand çeperan, di bin çeperên dijmin de neçar mabû li benda hevalan bisekine. Bi hêrsa tolhildanê ya di dilê xwe de li ser çeperên dijmin reşand. Wê rojê li çeperên dagirkeran ên li Girê Amediyê bi dehan leşker hatibûn kuştin.

**Di temenê xwe yê ciwan de tevlî gelek şeran bû**

Gotina 'Heta dilopa xwe ya dawî, heta fîşeka xwe ya dawî şer kir û şehîd bû' dibe ku herî zêde li Canşêr bê. Ev gotin bi şênberî herî zêde Canşêr pênase dike. Naxwe mirovek di 20 saliya xwe de çiqasî dikare tevlî şer bibe? Di temenê xwe yê ciwantiyê de mohra xwe danî binê gelek serkeftinan.



# 'Armanca dewleta Tirk têkbirina deskeftiyên gelê Kurdistanê ye'

Hevserokê Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD Salih Mislim diyar kir ku armanc ji êrîşên dewleta Tirk ya dagirker yên li ser herêmê, têkbirina aramî û hevgirtina gelên herêmê ye.

**Argêş Gewda/Qamişlo**

Hevserokê PYD Salih Muslim li derheqê êrîşên dagirkerîya Tirk yên li ser her çar parçên Kurdistanê bersiva pirsên rojnemayema me da, hevpeyvîn wiha bu:

**- Hûn êrîşên dagirkeriya Tirk yên li ser deskeftiyên gelê kurd çawa dinirxînin?**

Êrişên dagirkerên Tirk yên li ser herêmê konsepteke kevnar e. Ev konsepte sala 2016'an xistin merîyetê. Li her çar parçeyên Kurdistanê bi şêwazekî hemwext êrişan pêk tînin. Ev şere tunekirina gelê Kurdistanê ye û deskeftiyan armanç digire. Di ragihandina xwe ya şerê taybet de jî hertim êrişên xwe dikin rojev. Bi dagirkirina Efrîn û Serêkaniyê re jî, dagirkeriyê êrîşên xwe yên hovane yên li ser heremê domandin. Li hemberî wan êrîşan gelê Kurd yên her çar parçeyan dijîn her dem di nav berxwedanîyêkê dibûn. Li Başûrê Kurdistanê ev demeke dirêje alozî, şer û êriş diqewime. Li Bakûrê Kurdistanê jî di her aliyekî de şerê taybet ser gelê me tê meşandin. Pewîste gelê me hemberî wan êrîşan bi baldar tevbigere û xwe rêxistin bike. Dema dewleta Tirk ya dagirker wan êrîşan pêk tîne destûra dewletên navnetewî sitandiye. Dema mijar dibe Kurd û Kurdistan cîhan giştî dibe yêk û piştgrî didin hev. Ev şerê qirêj bi pêşengîya NATO tê meşandin. Pêwîste hemberî vê dijminahîyê em kesên demokrat, dostên gelê Kurd û rêxistin û komaleyên azadîxwaz re peywendiyan pêş bixin û ji bo deng bidin wê bê hiquqî yê. Ev jenosîd û qirkirina anîne li serê gelê Ermen û Suryan, heman demê de hewl didin ku gelê Kurd û Kurdistanê bi giştî qir bikin.

**-Li hemberî êrişên dagirkeriya Tirk, pêwîste çi li ser asta Bakur û Rojhilata Sûriyê, Kurdistan û tevahiya cîhanê bê kirin?**

Ev êrişên niha li ser gelê me tê meşandin, dîsa yê ku bersiva van êrişan dide ge bi xwe ye. Ji bona wê jî bersiva herî girîng şerê gelê şoreşgerî ye. Armanca dijmin valakirina gund û bajarên Bakur û Rojhilatê Surîyê ne. Pêwîste gelê me ji axa xwe dernekeve. Dagirkeriya Tirk ji bona demografiye erdnigariya herêmê biguherin serî her cure kiryaran didin. Efrîn û Serêkanî jî mînaka wê kiryarê ye. Li hemberî wê jî berxwedaniya gelê herêmê LI ber çavan e. Li hemberî gel tevahiya kiryarên dijmirovî tên kirin, lê gelê me berxwedanê didomîne, welatê xwe ne terikandin. Pêwîste piştê niha jî wisa be. Em ê bi ramanên Rêber Apo saziyên xwe bi hêzên û deskeftiyên xwe biparêzin û em ê nehêlin dagirker axa me dagir bikin.

**Ji bo Parastina Deskeftiyên gel li Bakur û Rojhilatê Suriyê di çarçoveya parastina civakî de, pêwîste Şerê Gelê Şoreşgerî çawa were meşandin?**

Deskeftiyên niha di destên me de ne, me bi darê zorê ji ti kesî nesitendiye, ev mafên me yê xwezayî bûn me destgirtin, Mînaka wê jî bi zimanê dayikê perwerde, avakirina saziyên kar û xebatên şoreşê ev hemû mafê gel bûn dîsa me bi destxistin. Erka me hemûyane ewe ku em xwedî wan mafên xwe derbikevin û biparêzin. Şerê gelê şoreşgerî wê erkê dide pêşiya me hemûyan. Saziyên me pêwiste kar û xebatên xwe bi şêwazeke rêk û pêk, pêk bîne. Yanî bi kurtasî tenê rêya gelê Kurd berxwedanî ye. Dijmin ti rê pêşîya me nehiştine. Pêwîste gelê me giştî kîjan saziyên Rêveberîya Xweser de kar bikin karê xwe baş bikin.

**Li hemberî bêdengiya navneteweyî bangawaziya we çi ye?**

Bangawaziya min ji bo gelê me yê welatparêz û heja em bizanin ku xwediyê vê axê emin. Pêwêste em



xwedî li rêveberiya xwe û zarokên xwe derbikevin. Em dijminê xwe baş nasbikin. Armanca dewleta Tirk ya dagirker hevgirtina herêmê xêrab bike. Pêwîste gelê me baldar nêzî vê mijarê bibe. Em yêkîtiyekê bidin avakirin. Em rê nedin dijminê dagirker ku aramiya navberê gelê Kurd û yê herêmê jîyan dikin de xêrab bike. Pêwîste em têkiliyên xwe yên saziyên navnetewî û dostên gelê Kurd xurt bikin. Ev jî dikeve ser mile saziyên me yên diplomasî yê û têkiliyên derve di meşînin. Heya niha kar û xebatên girîng jî meşiya ye, heya astekê. Dibe em xurtir jî bikin û em xwe gelê cihanê giştî bidin naskirin û pejirandin.

# 'Ciwan Û Avakirina Pêşeroja Azad'

**Ayşa Silêman/ Qamişlo**

**Hevserokê Encûmena Ciwanên Sûriya Demokratîk "MSD-Ciwan" Nasir Nasiro diyar kir ku armanca sereke ji konferansê avakirina Konfidralîzma Ciwanên Roihilata Navîn û Bakurê Efrîqiya ye.**

Insiyatîfa ciwanên Rojhilata Navîn ji sala 2014'an ve hat avakirin û xebatên xwe dan meşandin. Bi insiyatîfbûyîna Çend rêxistinên ciwanan li welatên curbicur, ji bo yekkirin, pêşxistin, zanakirin û perwerdekirina ciwanên Rojhilata Navîn, bê sînor û bê danansîna ji snorên kapîtalîzmê re, xebateke hevbeş bi hevre dan meşandin.
Di derbarê Konferansa Encûmena Ciwanan hevserokê Encûmena Ciwanên Sûriya Demokratîk ''MSD-Ciwan'' Nasir Nasiro ji Rojnameya me re axivî.

**Kar û xebatên insiyatîfa ciwanan**

Nasir Nasiro diyar kir ku isiyatîfa ciwanan yekemîn kongireya xwe li bajarê Amedê li darxistin û wiha got: "Di sala 2015'an de di kongirê de hijmarek mezin ji ciwanan ji hemû welatan kombûn. Bi hev re nîqaş û xebateke hev beş li ser alozî û pirsgirêkên ku ciwan tê re derbas dibin, kirin. Her wiha xalên destpêkê ji bo çareserkirina



pirsgirêkan hatin dayin. Piştî vê yekê wek encûmaneke ciwanên Rojhilata Navîn hat destpêkirin. Di vê encûmanê de li ser asta Rojhilata Navîn û tevahî dewletên ku tevlî vê kongireyê bibûn, xebatên wan heta sala 2018'an berdewam kir, ji xwe di wê demê de kongireya duyemîn a kombûyîna ciwanên Rojhilata Navîn li bajarê Silêmaniyê hat lidarxistin. Piştî wê di sala 2019'an de li bajarê Kobanê bajarê berxwedanê hat li darxistin. Lê mixabin derfetê derbasbûna gelek kesan ji bo Rojava nebû, bi taybet pirsgirêka Başûrê Kurdistanê û derbasbûna endaman."
Nasiro berdewamî da axaftina xwe û wiha got: "Piştî kongireya duyemîn gelek karên hevbeş û nirxandinên gelekî girîng hatin nîqaş kirin, di kongirê de encamnameya wê ya ku di kongerya yekemîn de hatibû dayîn jî ji nû ve hat sazkirin sazkirina. Ji destpêka sala 2023'an de daxwaza lidarxistina konferansekî ji bo ciwanên Rojhilata Navîn hebû, ku bibe çaremîn kombûna ciwanên Rojhilata Navîn. Lê rewşa ku Rojhilata Navîn tê re derbas dibû ne alîkar bû ku kongir were li darxistin. Lê belê komîta amadekar ji destpêka sala 2023'an de ji her çar parçan kombûn û dest bi karê xwe kir. Di heman demê de gelek kes ji Çolistana Rojavayî, Tûnis û Yemen jî tevlî vê ensiyatîfê bûn û cihê xwe di komîta amadekar bû, herwiha xebat bi hev re dan meşandin."

**'Ji 15 welatên cûrbecûr tevlî vê kongireyê bûn'**

Nasiro axaftinên xwe wiha domand û got: "Insiyatîfa ciwanan di 8'ê Pûşbera 2024'an de li bajarê Beyrût paytexta libnanê kongireya xwe li darxistin. Ev wek konfiransa duyemîn bû lê wek kongira 4'emîn e. Di vê konfiransê de rewş, etmosfêr, heyecan, fikir û ramanên cûda hebûn, ji ber ku hijmarek gelekî baş ji ciwanên Rojhilata Navîn tevlîbûn. Bi giştî em dikarin bêjin hijmar 80 kesayetên ciwan yên delege û nûnerên partî û rêxistinên ciwan bûn. Li ser asta Rojhilata Navîn ji 15 welatên cûrbecûr tevlî vê kongireyê bûn, ji Çolistana Rojava, Tûnis, Mesir, Sûdan, Filestîn, Urdin, Libnan, Yemen, Iraq, Sûriyê, Tikiyê, Îran, Kurdistan, Ermenistan, Bakistan, Bilûşistan û Efganistan. Herwiha ji pêkhateyên cûda jî di nav de cihê xwe girtin, ji hemû ol, pêkhateyên nijatî, pêkhateyên netewî yên cûr bi cûr, bi hemû nêrînên xwe bûn yek. Ji bo avakirina kesayetekî ciwan û pêşerojekî ciwan ku bikaribe ciwanan biparêze û siberojekî azad ji bo ciwana bide avakirin."
Nasiro da xuyanî kirin ku di konferansê de li ser du rojan kar û xebat hatin meşandin û wiha got: "Di roja yekemîn de gotina vekirinê ji aliyê komîta amadekar ve hat kirin, herwiha nameyên pîrozbahiya li darxistina konferansê hatin xwendin. Piştî wê derbarê şoreş û tekoşîna ciwanan li Rojhilata Navîn sinivîsyonek hat pêşandan. Piştre rûniştina yekemîn dest pê kir û tê de li ser gelek xalên girîng hat rawestandin, yek ji xalên ku hati nîqaşkirin jî şer û aloziyên bakurê Efrîqiyayê û Rojhilata Navîn bû."

**Naveroka roja duyem**

Nasiro da zanîn ku di roja duyem de gelek mijarên girîn hatin nîqaşkirin û wiha pê de çû: "Di rûniştina duyemîn de mjiyarên cûda yên wekî doza jin, rê û rêbazên parastina jinê û gelek xalên din jî hatin nîqaşkirin. Piştî wê li ser çar mijaran komxebat hatin li darxistin. Mijara yekem aloziya ekolojîk di civakê de û parastina xwezayê, mijara duyem pirsgirêkên jinê di civakê de û çareserî, mijara sêyemîn jî deshilatdariya li ser ciwanan û piçûkirina wan di civakê de û mijara çaremîn nijadperstî û netewperestî, zanistperstî, olperestî û zayendperestî bû. berî bidawîkirina konferansê encamnameya konferansê hat belavkirin. "

**Xalên bingehîn yên konferansê**

Hevserokê Encûmena Ciwanên Sûriya demokratîk ''MSD-Ciwan'' NasIr Nasiro di dawiya axaftina xwe de balkişand ser xalên bingehîn yên konferansdawî û wiha qedand: "Armanca sereke ji konferansê avakirina konfidralîzma ciwanên Roihilata Navîn û Bakurê Efrîqiya ye. Ev yek jî bi gelek xalan dest pê dike heya ku em bikaribin bidin avakirin, pêwîste ji mijarên nijadperestî, olperestî û zayendperestî durbikevin û ji avakirina jiyan û kesayeta ku bi hevjiyana azad bawer dike nêz bibin. Xala sereke ku ev konferans li ser hat rawestandin jî sîstema Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku niha tê bikar anîn wekî nimûne hat girtin. Têkoşîna li dijî zihniyeta piçûkxistina ciwanan û piçûkxistina jinan. Meşandina kar û xebatan li ser asta hemû deverên ku ciwan dikarin tê de cih bigrin. "

# Rojên Diyaloga Cîhanî ya Bi Rêber Abdullah Ocalan re

Di çarçoveya pêngava 'Ji Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêka Kurd re çareseriya siyasî'rêzeçalakiyên bi navê' Rojên Diyalogê yên Bi Abdullah Ocalan re'di navbera 15-22'ê Hezîranê de li 40 bajarên cîhanê têne lidarxistin. Çalakî, li ser mijarên bêhiqûqiya li Îmraliyê, girîngî û wateya paradîgmaya Abdullah Ocalan a ji bo gelan nirxandin tê kirin. Her wiha wê pirtûkên Abdullah Ocalan bêne danasîn, nivîsên wî yên li girtîgehê bêne xwendin, têkildarî tecrîda li Îmraliyê konferans, panêl, şano, çalakiyên hunerî, mîtîng, weşanên radyoyê û gelek çalakiyên cuda bêne lidarxistin.

**Zindan Şoreş/Qamişlo**

Abdullah Ocalan zêdeyî 25 sal in li Tirkiyeyê di hucreyên yek kesî de tê ragirtin û bi temamî ji cîhana derve qut bûye. Herî dawî di Tebaxa 2019'an de karîbû bi parêzerên xwe re hevdîtinê pêk bîne. Ji Adara 2021'an û vir ve hemû têkiliyên wî hatine astengkirin û di derbarê tenduristiya wî de fikarên cidî hene. Li helwesta saziyên yên weke CPT (Pêşîlêgirtin a Tundiyê ya Awropa), Konseya Ewropayê û Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê ne zelal e. Ligel gelek serlêdan û agahiyên berdest jî ser vê bi hiqûqîyê li ti mudaxele nehatin kirin. Nivîsên Rêber Abdullah Ocalan îlhamê dide rewşenbîr, azadîxwaz, zanyar, kedkar, aktîvîst, hunermend, sendîkavan, tevgerên civakî, siyasetmedar û tevahi civakên Rojhilata Navîn. Rêber Abdullah Ocalan 25 sal berê bi komployeke navneteweyî neçar ma ku ji Sûriyeyê derkeve. Ji ber ku bi navê Bihara Gelan, li Bakur-Rojhilatê Sûriyeyê rexistin buyinek civakî ya xweser, li ser esasê fikrên azadiya jinê, ekolojî û demokrasiyê a paradîgmaya Rêber Abdullah Ocalan hatiye avakirin.

**Armanca Komxebatê li Ewropa danasîna ramanên Rêber Abdullah Ocalan e**

Ji bo fikir û felsefeya Rêber Abdullah Ocalan di asta gerdûnî de bê naskirin û nîqaşkirin, bi navê 'Rojên diyalogê yên bi Rêber Abdullah Ocalan re' tê destpêkirin. Rêzeçalakî 15'ê Pûşber'ê destpê kir û heya dîroka 22'ya heman mehê dê bidome. Rêzeçalakî li nêzî 50 bajarên Ewropa û Efrîka dê pêk bê. Di çalakiyê da pirtuk, paraznameyên Rêberê gelê Kurd bên xwendin û nirxandinên wî dê bên guhdarkirin û bên nîqaşkirin. Armanc ew e ku fikir û ramanên Rêber Abdullah Ocalan li asta gerdûnî belav bibin.

**Mijarên ku dê komxebatê de bê nîqaşkirin wisa ne**

- Nêzîkatîya Rêber Apo a modernîteya demokratîk de û fêmkirina tegîna faşîzmê.
- Bi gotina afêrînerên wê 'Jin Jîyan Azadî' Rêbertî û Jinên Kurd
- Berxwedana çandê: ji berîya wêndabunê ber bi tolhildana kevneşopîya li ser dewleta netewî.
- Derfet û xeterîyên şerê cîhanê yê sêyem.
- Ekolojî: serhildana Jîngehê.
- Girîngiya xweparastinê: Teorîya Gulê.
- Ji nû ve pênasekirina sîyaseta demokratîk: Sîyaset Wek Hunera Azadîyê.
-Têgîna dewletê :Dewlet tê wateya desthildarî, sîyaset tê wateya afîrînerî.
-Pirsgrêka şer û aştîyê: Nexşerêya danustandinan li gel Rêbertî 2011.
- Di sedsala 21 'emîn de perspektîfên xwerêveberî û xweserîya netewîyî: ji nû ve fikirindana mafê çareserîyê ya paradîgmeya Rêber Abdullah Ocalan.
- Ol: Ol berxwedanek exlaqî ye.
- Pergala Îmralîyê: Di hiqûqa Ewropa de gemara reş.
- Dîrok û Berxwedan: Pergala Şaristanîya Demokratîk.
- Aborî di teorîya modernîteya demokratîk de: Kapîtalîzm ne aborî ye, desthiladarî ye.
- Ciwan: Konfederalîzma Ciwanên Demokratîk.
- Teorîya Modernîteya demokratîk: Pêşengîyek ji bo avakirina enternasyonalîzmek nû.
- Da nasîna Felsefeya Rêber Abdullah Ocalan: Rejîma Heqîqetê ' Rastî tenê dikare civakî be.

**Bernameya Bajarên rêzeçalakiyan**

Di çarçoveya hemleya azadiyê de welatên wekî Fînlandiya, Swêd, Fransa, Almanya, Katalonya, Yewnanîstan, Îtalya, Swîsre, Kolombiya, Qibris, Belçîka, Îngilîstan, Polonya, Slovenya û Kenya bi navê "Rojên Diyalogê bi Abdullah Ocalan" di navbera 15-22'ê Pûşberê de wê li gelek welatan rêze çalakî û çalakî bên lidarxistin.
Pirtûka ku gotarên Abdullah Ocalan tê de bi sernavê "Modernîteya Demokratîk" dê li Swêdê bê çapkirin û di hemû çalakiyên ku dê di navbera 17-22'ê Pûşberê de li 6 bajaran bên lidarxistin de, wê bê danasîn.
Li Fînlandiyayê ji aliyê Tora Piştevaniya Helsînkî ya Kurdistanê ve dê der barê pergala Îmraliyê û Rêber Abdullah Ocalan de hevdîtinên agahdarkirinê bên lidarxistin. Parêzer Rengîn Ergul û nûnera Akademiya Modernîteya Demokratîk dê beşdarî civînên ku dê li Helsînkî (16'ê Pûşberê) û li Turkuyê (19'ê Pûşberê) bên lidarxistin bibin.

Li Elmanyayê wê li Berlîn (20'ê Pûşberê), Stuttgart (16'ê Pûşberê), Hannoverê



(18-20'ê Pûşberê) çalakiyên cuda yên xwendin û agahdarkirinê bên lidarxistin.

Li Îspanyayê wê di 15'ê Pûşberê de li Girona serxwebûn, demokrasî û neteweya demokratîk bê nîqaşkirin. Li Lleîda, di 17'ê Pûşberê de Komîteya Piştevaniya Kurdistanê wê bi dramatîk metna şanoyê ya "3 Jiyan Abdullah Ocalan" û li ser paradîgmayê nîqaşeke vekirî pêk bîne. Pêşniyara neteweya demokratîk û nêzîkatiya konfederalîst a ji bo Katalanan wê di 19'ê Pûşberê de li Valenciayê bê nîqaşkirin û di 22'ê Pûşberê de li Barcelonayê wê Şerê Sêyemîn ê Cîhanê û avakirina Konfederalîzma Demokratîk were nîqaşkirin.

Wekî din, wê li Bogota, paytexta Kolombiyayê (22 Pûşber) atolyeyek hunerî were lidarxistin.
Li Atînaya paytexta Yewnanîstanê wê di 20'ê Pûşberê de ji bo azadiya Ocalan heta ber Sefaretxaneya Tirk meş bê lidarxistin û di 19'ê Pûşberê de jî panel bê lidarxistin.
Ji xeynî van welatan rewş û fikrên Ocalan wê li Fransa, Îtalya, Belçîka, Qibris, Awûstûrya, Skoçya, Swîsre, Polonya û Kenyayê jî bên nîqaşkirin.

# Çarçoveya têgînî... Aborî

**Ji remanê Rêber Apo**

Nexasim, ji ber ku hatiye fetîşkirin, gelekî girîng e ku mirov ekonomiyê di nava sînorên destnîşankirî de bide naskirin. Lîberalîzm her tiştî bi ekonomiyê rave dike û bi vî awayî danasînê bêmane dike û her diyardeya berevajî ekonomiyê jî ekonomî dihesibîne. Bi awayekî giştî, mirov dikare ekonomiyê weke çalakiya tedarik û debarê ya pêdiviyên civakê yên maddî û weke îfadeya pîvan û saziyên wê rave bike û di çarçoveyeke tengtir de mirov dikare weke pevguhertina pêdiviyên maddî bi rêya bazarekê bide naskirin. Ekonomiya bazarê ya li şûna nirxa bikaranînê nirxa pevguhertinê esas digire û bi vî awayî danasîna wê tê qebûlkirin, lê rastiyek heye ku divê neyê jibîrkirin, kapîtalîzmê çawa qada demokratîk rizandiye, qada ekonomîk jî kiriye bin destê yekdestdariyên sermaye û dewleta netewe û bi vî awayî pûç kiriye. Ekonomiyê mîna xebateke yekdestdariyên sermayeyê li bazarên di bin banê dewleta netewe de têne avakirin, didin naskirin. Li vir, ekonomî tê înkarkirin, li şûna wê ya ne ekonomî ye, û ya înkara ekonomiyê ye, sîstema kara zêde ya yekdestdariyên bazirganî, pîşesazî û fînansî tê danîn; mîna ku xebata ekonomîk a ezel-ebed ji van yekdestdariyan pêve tiştekî din nîne û bi vî awayî ev sîstem di bin navê zanista ekonomiyê de bi rewakirineke zêde tê pêşkêşkirin. Mirov vê xebatê dikare weke terora ekonomîk jî şîrove bike. Ango civak ji aliyê aborî ve tê hilweşandin, dor li bazarê tê girtin bi tenê dikin qadeke karê, bi navgînên fînansî li qadên bazirganî û pîşesaziyê bi tevahî têkiliyên yekdestdariyên kapîtalîst bi ekonomiyê re ji holê têne rakirin û bi vî awayî bi pereyan bidestxistina pereyan dikin kategoriyeke bingehîn a bidestxistinê û ev jî dibe faleketeke ku di dîrokê de nehatiye dîtin.
Serdema fînans kapîtalê asta herî jor a hilweşîna ekonomî û civakê ye. Em bi cinawirekî wisa har re rûbirû ne ku karekterekî xwe yê antî-civak, antî-mirov û antî-xweza heye; hema bêje nîviyê civakê bêkar kiriye, di bin navê ekonomiya sîlehan de hilberandina amûrên tinekirinê kiriye karekî bingehîn ê ekonomîk, bi tenê armanca xwe kar e, ti têkiliya xwe bi pêdiviyên hewce yên civakê re nîne, hawîrdorê hildiweşîne, bi tevahî çavkaniyên xweza û civakê vediguherîne karê. Li vir a girîng ew e, li rêza pêş qurbanên vê sîstemê jin û ciwan in; keda wan bêkêr dikin û wan neçar dihêlin ku bê ekonomî bimînin. Li hemberî vê, her yek ji begzadeyên CEO'yan (Chief Executive Officer) ku gurên rêveberiya desthilatdariyê ne û ti têkiliya wan bi ekonomiyê re nîne, weke damezrînerên ekonomiyê têne pêşkêşkirin û ev nakokiya bi serê mirov nakeve weke xebateke sereke ya ekonomîk manedar dibe. Yekdestdariyên olîgarşîk ên pirraniya civakê ji ekonomiyê qut dikin, karê weke ajoya bi tenê dibînin û yekdestdariyên mêtinkariyê yên ti têkiliya wan bi civakê re nîne ava dikin, divê mirov kansêrkirina wan a civakê ya ji desthilatdariya dewletê jî wêdetir e, ekonomîk nehesibîne û di asta manûnemanê de girîng e ku mirov hukim bide ew înkara ekonomiyê ne. Rahibên modern ên serdema modernîteya kapîtalîst, di bin navê zanista ekonomî û polîtîkayê de ji afirandinên mîtolojîk ên Serdema Rahibên Sumeran hezar carî zêdetir berjewendiyên hêzên li derveyî civakê kirine mît û divê mirov fonksiyona wan a rastî baş bide naskirin.
Divê mirov şîrketên CEO'yan jî li vê kategoriyê zêde bike. Divê em ji bîr nekin ku dewleta netewe bi awayekî bingehîn ev sîstema zorê ya nîzama rahibên modern e. Li ser navê zanistê yê herî zêde xwe li kapîtalîzmê rakişandiye K. Marks e. Lê ew jî mîna ku zemînekî wî yê rewa hebe, xwestiye vê sîstemê zanistî bike û di vê çarçoveyê de xebata xwe ya Das Kapîtalê kiriye. Lewma hewce ye ku xebata wî ya bi navê Das Kapîtal ji nû ve were şîrovekirin. Herçiqasî di gelek qadan de hewl daye maskeya wê ji rûyê wê bike jî bi sedema ku kapîtalîzm weke sîstemeke dîrokî ya bivênevê pêşkêş kiriye, di tehlîla dawî de ev sedema bingehîn e ku Marksîzm di nava modernîteyê de bihele. Weke ku li cem Yekîtiya Sovyetê ya sosyalîzma pêkhatî û ezmûna Çînê hat dîtin xizmeta herî mezin ji lîberalîzmê re kirin û bi vî awayî di nava sîstemê de cihê xwe girtin û ev jî ji nêz ve bi vê rastiyê re têkildar e. Sîstema kapîtalîst civaknasiyê weke ekonomî pêşkêş dike û ekonomî jî li cem wê timî înkara ekonomiyê ye. Eger ev analîz di çarçoveya sîstema kapîtalîst de were kirin, di qada zanistî de ev krîz bi xwe ye. Lewma mirov heta ji krîza ekonomîk-polîtîk a ku tevahiya zanista civakî dibe krîzê nebihure, nikare ji krîza li cem tevahiya zanistên giştî yên ku perspektîfa xwe ya sazîbûn (zanîngeh), mejî û felsefî ji dest dane, bibihure. Mirov heta ji krîza zanistî nebihure, zanist ji nû ve xwe di warê sazî û manedanê de ava neke, nikare ji krîza giştî ya civakî û harbûna modernîteya kapîtalîst bibihure.



**Gelo em, li Imrali dinêrin û xwe dipîvin?**

**Ahmet Aktaş**

Ji bo ku em siyaseta qirker a dewleta AKP-MH'ê ya li dijî gelê Kurdistanê nas bikin, divê em siyaseta li Îmraliyê li ser Rêber APO birêve dibe, baş nas bikin.
Êrîşkariya dagirkerî ya li hemû kurdistanê û her wiha destdirêjiyên welatên din, hemû encamên siyaseta li Îmraliyê ye.
Jiber ku dewleta tirk, li ser siyaseta tirkkirin û tunekirina gelê Kurdistanê hatiye damezrandin û bi endamtiya NATO re, bi tevayî li gor berjewendên NATOyê siyaset meşand.
Her wiha, ji bo misogerkirina projeya mezin a Rojhılata Navîn a sedsala 21ê, Receb erkdar kirin.
Êdî, siyaseta derve û hundur, di vê çarçovê de dizayn kirin û dîlgirtina Rêber APO jî li ser vê projeyê pêkhat.
Jiber ku hegemonên cîhanê, felsefe û siyaseta Rêber APO, ji bo sistema xwe asteng û alternatif dîtin, lewma bi plangeriyek navdewletî dîl girtin û şandin êşkencexaneya Imralıyê!
Îca divê ev mijar, berfirehtir were şîrovekirin, ne bi tinê li goreyî armanc û daxwazên Receb, Bahçeli, Berzanî û filan kesan.
Heke di çarçova plangeriya navdewletî de werin şîrove kirin, hingê siyaseta qirker zelaltir tê nas kirin û têkoşîna li dijî wan jî wê baştir were birêvebirin û wê serkeftîtir be.
Imrali, mîna laboratuwarê xebitandin; li goreyî encamên hildidin, stratejî û tektîkan diafirînin û li ser vê bingehê êrîşî gelê Kurdistanê û Tevgêra Azadiyê dikin.
Lewma divê hemû kurdên welatparêz, dostên kurda û kesên demokrat, her dem jixwe pirs bikin, "ka gelo ev Rêber, 26 sal e di bin vê sistema navdewletî ya êşkencê û tecrîdê de û bû 40 meh e bi tevayî têkilî hatiye birîn, ma sax e an na(?), ev kesê ewqas ji bo me berxwe dide, ma gelo em çiqas ji bo rizgar kirin û azad kirina wî dixebitin?" û hwd.
Heke em van pirsan, her gav ji xwe nekin û bersîva wan baş nedin, weke Rêber APO gotiye "êm, herkesê li Îmraliyê binere xwe di wir de nebîne û xwe ne pîve" em ê nikaribin rojev û plansaziyên li gor demê çêbikin, her wiha em ê nikaribin bibin xwedî xebat û têkoşîna serkeftî.
Jixwe siyaset û armancên wan aşkere ye; dixwazin, vê rewşa Rêber APO bidin jibîr kirin û mîna rewşek asayi/normal bidin qebul kirin, wateya vêya jî mirin e!
Wisa diyar dibe ku wê li dijî serkeftinên gerilla, hin pirtir êrîşî xebat û destkeftiyên siyasî û demokratîk bikin; qeyûm, kuştin, girtin, koçber kirin û hwd.
Li dijî vê siyaset û êrîşîn xedar, divê gelê Kurdisitanê û dostên xwe, li şwîna rojevên dewletan ew rojevên xwe biafirînin, paralelî berxwedana li Imralıyê ya Rêber APO û têkoşîna serkeftî ya gerila, di çarçova mafên xwe yên rewa û yasayî de, rabin serîhildanên civakî, bi biryarî û piralî çalakiyên domdar û encamgîr lidar bixin,
Divê ev baweriya jêneveger her hebe: heke Rêber APO rizgar û azad nebe, pirsgrêk çareser nabin.
Lewma divê bêgotin û bênîqaş, teqez azadıya Rêber Apo were xwestin, divê ev mijara sereke ya rojevê be, heke ev mijar misoger nebe, rawestan jî ji me re nabe!



# Revandina Silêman Ehmed êrişeke li dijî rojnamegeriyê ye

Rojnamevan Zinar Cafer diyar kir ku dema mirov bi taybet behsa kiryarên PDK'ê bike yekser îxanetên ku di derheqê gelê kurd de dide meşandin tê bîra mirov û wiha got, "PDK'ê di derheqê gelê kurd de gelek kiryarên bi ziyan kirye, revandina Silêman Ehmed jî yek ji wan kiryara ye."

**Berçem Silêman/ Qamişlo**

Rojnamevan Silêman Ehmed 1'ê Cotmehê derbasî axa Rojava bû da ku sardana malbata xwe bike, piştî sardana malbatê bi 25 rojan, dema ku carek din xwest vegere Başûr li ser deriyê sînor ji aliyê PDK'ê ve hat revandin.
Derbarê revandina rojnamevan Silêman Ehmed rojnemevan Zinar Cafer ji Rojnameya me re axivî.

**'Li dijî Silêman Ehmed sûc tên kirin'**

Zinar Cafer diyar kir ku ji kêliya revandina Silêman Ehmed ve di derheqê wî de kiryarên nemirovî têne kirin û wiha got: "Piştî berxwedaniyeke bê hempa ji aliyê heval, saziyên mirovî yên herêmî û yên navneteweyî ku zext li PDK'ê dikirin



da ku bikaribin rewşa Silêman Ehmed nas bikin, piştî 211 rojan ji berdewamiya zexta ku li ser PDk'ê hatî kirin, PDk'ê neçar ma ku derftê bide Silêman Ehmed da ku hevdîtinekî bi parêzerê xwe re pêk bîne. Di wê hevdîtinê de Silêman Ehmed spasiya herkesê ku bi vî kar û xebatî rabû û spasiya herkesê ku piştgirtiya kampaniya azadiya wî kir. Di heman demê de pangewazî kir ku diha bêtir asta têkoşînê bilindtir bikin da ku kiryarên ku di derheqê rojnemevanan de tên kirin werin rawestandin."
Cafer axaftinên xwe berdewam kir û wiha got: "Ji aliyê YRA li Rojavayê Kurdistanê zextek mezin li saziyên têkildar kir, bi taybet di milê rojnemevantiyê de ku bi rol û misyona xwe rabin, ku bikaribin azadiya Silêman Ehmed bi dest bixin. Ev 224 rojin hîn rewşa wî nezelal e, lê di 30'ê Pûşber ê de biryara dadgehkirina wî hatiye dayîn. Ev biryar girêdayî zagona Iraqê ya girêdayî ewlekariya Bajûr, ev yek bi xwe sûceke, ji ber ku ew doza pê were dadgehkirin, dûrî rastiyê ye. Ji ber ku Silêman Ehmed edîtorê beşa erebiye, tu bandora wî li ewlekariya herêma Kurdistanê nîne. Tenê derbasbûn û vegera wî ji bo sardana malbata wî bû, ji ber ku ev mafê herkesî ye ku bikaribe sardana malbata xwe bike."

**Têkoşîna rojnemevanan ji bo azadiya Silêman Ehmed**

Rojnemevan Zinar Cafer di dawiya axaftinên xwe de wioha got: "Divê mirov ji kesayeta xwe dest pê bike, em ê bi kesayet, pênûs, kemîre û di gotinên xwe de jî diha bêtir bikaribin asta têkoşîna xwe bilind bikin. Ji ber ku bilind kirina asta têkoşînê rê digre li hember dagirkeriyê û kiriyarên binpêkirinê yên ku di derheqê hemû gelên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê yê de ku tê meşandin. Ne tenê di derheqê rojnemevanan de, ji ber dema rojnemevan tê hedef girtin di kesayeta rojnemevan de dixwazin wê civakê ji rastiya wê dûr bixin û biçewisînin. Ji xwe wek rojnemevan silogana me ya sereke ew e ku em bikaribin li ser şopa heqîqetê kar bikin, di heman milî de divê deha bêtir em wek rojnemevan, kesayet, sazî, hiqûqnas û lêkolîner ku bikaribin destkeftiyên heyî biparêzin. Her wiha em bikaribin di vê Şoreşê de cih bigrin û bibin dengê rastiyê, hevalên me yên ku gihiştine asta şehadetê jî em wan bi bîr tînin, ew jî ji bo me bûne wek sembol. Hêviya me ji gelên herêma Bakur û Rojhilatê Sûrî re heye ku, bi hemû pêkhate, ol û civakên ku di Sûrî de cihê xwe digrin ku em deha bêtir hebûn û yek rêzbûna xwe bidin nîşandan. Ji ber ku yekrêzbûna me ji hêza me tê, ew hêza ku ji me tê xwestin ku em bikaribin bi riya wê rê li ber dagirkeriyê bigrin. Di heman demê de bikaribin destkeftiyên şoreşa Rojava biparêzin."

# Avakirina civakek saxlem bi parastina ekolojiyê pêkan e

**Navenda Nûçeyan**

**Di dema şaristaniyê de qirkirinên pir mezin li ser ekolojî çêdibûn, lê bi berxwedanî û paradîgmaya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Oacalan wateya ekolojiyê ya rast di mejiyê gelan de hate afirandin.**

Parastina jîngehê yek ji mijara her girînge ku mirov li ser bisekine û li ber çavan derbas bike. Ji ber ekolojî bi tendirustî û derûniya mirovan ve têkildare. Ji bo ku em xwedî li paqijiya jîngehê derkevin, divê civak bi taybetî sazî û dezgehên girêdayî civakê parastina çanda xwezayê bikin, bi hev re herêmeke paqij û ewle ava bikin. Yek ji xalên herî girîng ên paradîgmaya Abdullah Ocalan û Şoreşa 19'ê Tîrmehê kar û xebatên parastina jîngehê bû. Ji ber ku beriya şoreşa 19' Tîrmehê ji milê sîstema serdest ve tu guhdan ji bona xwezaya jîngehê nedihat kirin. Her wiha hemû sererd û binerdên xakê dihatin talankirin. Lê bi hatina Abdullah Ocalan û Şoreşa Rojava, Desteyek bi navê Jîngehê ya ku ji aliyê Rêveberiya Xweser ve hat avakirin bi erkê paqijiya derdorê û jîngehê radibe. Bi qasî ku mirov ji bo xwe nasname û çand diparêze û girînng dibînin. Divê ekolojiyê jî ji bo xwe wek nasname bibînin, ji ber ku ekolojî bingeha civakê ye. Gelek zindî li ser ruyê erdê hene û rojane jî jiyan dikin. Ekolojî girîngtirîn tiştên ku me ji ziraran diparêze û bandorê li hebûna zindîyên li ser rûyê erdê dike. Bandorek pir mezin li jiyana mirovahîyê dike. Ji ber vê yekê parastina jîngehê di rastiya xwe erkê me ya girîng û sereke ye.

**MIROV JI XWEZAYÊ DÛR BÛNE**

Em dikarin bibêjin ku di destpêka mirovahiyê de li kokên vê pirsgirêkê bigerin. Bi zêdebûna desthiladariyên di nav civakê de mirov ji hevdû dûrketin û di heman demê de mirov ji xwezayê jî dûr bûn. Mirov dikare bîne ser ziman ku civak di cewherê xwe de rastiyeke ekolojîk e. Mebest ji ekolojiyê ew e ku bi ruhekî pak, civakê zindî bike. Ders û encama em dikarin ji vê bigirin, ew e ku mirov nikare di bin desthiladariyê de bijî. Ji ber wê jî divê em ekolojiyê biparêzin û cihekî ekolojîk taybet di jiyana xwe de ava bkin.
Civak û ekolojî wek goşt û neynûk in, tu car nikarin ji hev dûr bikevin ji ber ku ekolojî û civak hev temam dikin. Bi vê armancê jî eger em daxwaza civakek pak û xweşî bikin mijara destpêkê em li ser bisekinin dibe ku ekolojî be. Dikare bê gotin ji despêka ku mirovên sereke hîmên xwe avêtiye li ser vê axê heya roja me ya îro rolek girîngî daye her tiştên hewîrdora xwe. Yanî xweza bi awayek zindî dîtiye û pênase kiriye. Di heman demê de hemû bûyerên ku di xwezayê de rû didin, di hêla mirov de pêhesîn dide avakirin. Ev jî tê wateya ku mirov çiqasî bi ekolojiyê bandor dibe. Emê bi gotinek Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dawî li hevoka xwe bînin, "Şoreşa Mirovahiyê pêwîstiya xwe bi kedê heye", yanî mirov dikare bibêje hilbirîna axê di kesayeta Jin-dayik û ekolojî de tê diyarkirin. Di heman demê de kesê berdevkiya vê mijarê dike jin e.

**Rêberê Netewî Abdullah Ocalan mafê ekolîyê dayê**

Cîhan di milê ekolojî de berî salên borî zêdetir bi baldar bû. Ji ber ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ekolojî kiriye yek ji stûnên bingehîn ên paradîgmayên ku ji bo Rojhilata Navîn û tevahî cîhanê re. Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di derbarê Ekolojî de gelek lêkolîn û mijar nivîsandine, di heman demê de di paradîgmayên xwe de diyar dike ku mirov ji ekolojiyê gelek bandor dibe û gotiye: "Eşkere ye ku pirsgirêka îndustriyalîzmê parçeyeke ku ji sedemên wê yên bingehîn ekolojî ye." Ji ber ku çiqas mirov ekolojî tenê wek têgîn pênase bike tu car nagehe armanca xwe ya bingehîn. Ev pirsgirêk jî ji aliyê civak û mirovan ve hatiye afrandin. Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan çima ew qas giringî daye ekolojî? Ji ber ku ekolojî rastî û azadiya civakê nîşan dide. Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan gotiye: "Belkî jî tu pirsgirêk bi qasî ekolojiyê girîng û giran nîne", di vê mijarê de em girîngiya ekolojî dibînin. Di serdema şaristaniyê de desthilatdaran bi her awayî civak û ekolojî binpê dikirin. Dizanî bûn ku ekolojî û jin bingeha civakê ne. Lewma têgîna ekolojiyê şaş di mejiyê gelan de didan avakirin. Ev jî ji bo ku civak bi xwe were rûxandin, di paradîgmaya xwe de sedem û çareserî nîşan daye. Em qet na pirsin gelo çima civaka xwezayî bi navê xweza hatiye naskirin? Civaka xwezayî civakek ku xweza û jin ji bo xwe Xweda didîtin. Her wiha kesayeta xwe di xwezayê de zindî didîtin, ji ber ku dihizirîn ku xweza çiqas giringî û sûdek mezin li mirov û civakê dike. Berî 11 hezar salan, tê gotin ku mirov rû bi rûyê hinek nexweşiyan wekî îro ku em jiyan dikin hatine. Lê belê bi rêbazên xwe yên xwezayî û ceribandinan, gelek nexweşî derbas kirine û jiyanek xwezayî hatîye domandin. Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di paradîgmaya xwe ya Sosyolojiya Azadiyê de tîne ser ziman: "Civaka mirov li gorî ruhberên din hemûyan weke xwezayeke mejî, nermiya wê di ser hemû re tê naskirin. Jixwe di analîza dawî de civaka mirov jî hebûneke zindî ye, gerdûnîye. Berhemê atmosfereke avhewayê ye bi nazikî hatîye birêkûpêkirin. Berhemên jiyanê şînatî û lawir in." Ev hemû jî bi hev re girêdayî ne wek zincîrek eger xelekek jê winda bibe, ew zincîr naçe serî, ji bo wê jî divê em xwedî li her zindîwarek ku li ser rûyê cîhanê dijî



derkevin. Her wiha Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan gotiye, "Ekolojî zanista hemû bûyer û pêşketinên herî mezin e". Divê em xwedî li civaka ekolojîk derkevin û wê biparêzin, ji ber ku nirxek ji nirxên herî giran ekolojî ye.

**BANDORA ŞER LI SER EKOLOJÎ**

Bandorek şer a herî mezin li ser ekolojî heye. Mînak êrîşên dewleta Tirk a dagirker ên li ser Bakûr û Rojhilatê Sûriyeyê bandorek li warê ekolojiyê kir. Bi şer gel ji aliyê derûnî ve gelek bandor dibin û ev bi taybetî jî li ser xwezayê bandor dike. Di heman demê de dema ku şer diqewime şaredarî nikarin bi erka paqijiyê rabin û xwezayê biparêzin. Ji ber wê jî tax, kolan, baxçe, park û her cihê runiştinê qirêj dibe. Her wiha bi sedema şer av tê qutkirin. Av jî jêderek ji jêderên bingehîn ê jiyan, mirov û ekolojiyê ye. Dema ku topebaran li ser xakê çêdibe, ekolojî hîn bêhtir rû bi rûyê têkçûnê dimîne. Mînak madeyên kîmyayî yên ku dewleta Tirk a dagirker li ser xwezaya Rojava direşîne. Ji ber ku dizane gelê Kurd ekolojî nirxa bingehîn a gelê Kurd e, êrîşên wiha pêk tîne. Bi vê yekê destpêkê êrîşî ekolojiya civakê dike da ku îradeya gel were şikandin. Mînaka herî ber bi çav dema ku dewleta Tirk a dagirker Efrîn dagir kir, destpêkê darên zeytûnê ku kevneşopî, çand, hebûn û nirxên gelê Efrînê bûn, hemû jêkirin da ku gelê Efrînê ji hêviyê qut bibin. Em dizanin ku ekolojî tu car bandorek neyînî li mirov û civakê nake, lê mirov bandor û zirarê li ekolojiyê dike. Ev yek ne tenê ji bo Rojavayê Kurdistanê ji bo tevahî cîhanê ye. Şerê ku li cîhanê diqewime, li dijî ekolojiyê jî tê meşandin. Bandora herî mezin li ser ekolojî tê kirin.

**RÊ Û RÊBAZÊN XWEDÎ DERKETINA LI EKOLOJIYÊ**

Riyên ku mirov li ekolojiyê xwedî derkeve û wê biparêze hene. Bi taybet em wek gelê Kurd û tevahî gelên Rojhilata Navîn bi paradîgmayên Rêberê Gelê Kurd Adullah Ocalan, riya çareseriyê ya her pirsgirêkê dibînin. Ji ber ku Abdullah Ocalan di paradîgmayên xwe de çareserî pêşkêşî me kiriye. Em nehêlin ku şerê dewleta Tirk a dagirker bandorê li ekolojiya me bike. Divê di derbarê ekolojî de konferans û panel werin lidarxistin. Her wiha divê ji aliyê desteya jîngehê û şaredariyê ve, paqijiya derdorê baş pêk bînin. Dive kargeh jî dûrî cihekî ku xweza tê de hebe werin avakirin, da ku dûmana kargehan li ekolojiyê bandor neke. Ji bo em civakek pak û tendurist ava bikin divê destpêkê ekolojî were parastin.